# Dîroka muzîka Kurdî ya başûr di sed salên borî de

Nivîs: Qendîl Şeyxbizînî
KurdîPedîa - 2024

Kurte behs:
Di vê kurte xebatê de, hin zanyarî û data hatine analîz kirin. Serbarê ku zanyarî û çavkanî jî kêmpeyda ne, lê bi sûd wergirtin ji hin pirtûk û nivîsên derbarê vê mijrê, analîz û lêkolînan de, ev kurte xebata hanê berhem bû.


Brief description:
In this brief work, some knowledge and data have been analyzed. Because knowledge and resources are scarce, but with the benefit of some books and articles about this topic, analysis and research, this short work was produced.

**KURTE** .......................................................................................................... I
**NAVEROK** ....................................................................................................... II
**PARA YEKEM** ................................................................................................. 1
**PÊŞEKÎ** .......................................................................................................... 1
1: TEVGERÊN MÛZÎK Û HUNERA KURDÎ ................................................. 3
1.1: JIN DI MÛZÎK Û HUNERA KURDÎ – BAŞÛR DE .................................... 14
**PARA DUYEM** ................................................................................................ 16
2: MÛZÎK Û HUNER LI HEWRAMAN – BAŞÛR ........................................... 16
2.1: LI BAŞRÊ KURDISTANÊ MÛZÎK Û HUNER DI ÎRO DE ........................ 18
**ENCAM** ......................................................................................................... 19
**ÇAVKANÎ** ....................................................................................................... 20

**Pêşekî**:

Hunera stran û dengbêjiyê bi giştî beşek ji çand û dewlemendiya her welat, civak û neteweyekê ye, berî her tiştî ew cure rîtualeke dînî û mîtosî bûye ku bi xwezayê re û diyardeyên ban-xwezayî û metafizîkî re têkilî daynin.

Zagros, Toros û Mezopotamya Mezin hêlîn û dergûşa şaristaniyê ye ku mûzîk jî pareke mezin digire di wê şaristanî û jiyariyê de. Li gor lêkoler û arkologan, li ser asta cîhanê kevintirîn metn û notên nivîsî ya muzîkê li ser asta cîhanê li Kurdistanê ye û vedigere çaca Hûriyan 3300 – 3400 berê li rojavayê Kurdistanê.




*Tabloya hirî ya nivîsnoteke mûzîkî ya gelê Hûriyan li rojavayê Kurdsitanê*

Her weha Kevintirîn tomara dengî ya zimanê kurdî vedigere 1908 Rojhilatnasê navdar ê Alman û serok û parêzerê Kitêbxaneya Almanî Oscarmann di sala 1901ê de ji bo xwendina zimanên îranî çûye Kurdistan û Îranê û demekê li bajarê Mehabadê yê Rojhilatê Kurdistanê dimîne û li cem Mîrza Cewadî Qazî xwendina kurdî kiriye 1882- 1958. Ji bo edebiyata devkî jî Oscarman ji Mîrza Cewad fêr dibe. Di sala 1908an de Oscarman û Mîrza Cewadî Qazî du stran li ser gramafonê tomar dikin, yek ji wan straneke gelêrî ye û ya din jî helbesteke Nalî ye, ku dibêje: "Ev tomar belkî kevintirîn tomarên dengî yên zimanê kurdî ne, ku bi gramafonê hatine tomarkirin. (hajenews side. 2023)

*Têbînî: Helbet rayek heye ku dibêjim wê demê amûra "Gramafon"ê nebû, belku amûreke dî hebû berî gramafonê jêre "Monograf" digotin, ahtiye tomar kirin*

Em dikarin ev yek weku jêdera mûzîk û strana Kurdî dast bikin bi taybet bo zarê Kurmanciya navîn naku Soraniyê ku zarê hevpar e di navbera Rojhilat û başûrê de. Muzîk û hûnerê jî weku pareke sereke di wê geozimanî de .

Dîroka hunera stran û dengbêjiyê ji ya muzîkê kevntir e. Heger em bixwazin temenê strana kurdî diyar bikin, gerek em ji dema hebûna kurdan dest pê bikin. Hama Hemabaqî di pertûka xwe ya "Dîroka Muzîka Kurdî" de dibêje: Ji bo dîroka peydabûn û zayîna muzîka Kurdî diyarkirina salek yan jî heyameke diyarkirî pir zehmet e. Lê li gor daneyên heyî em dikarin bêjin destpêka stranên kurdî vedigere serdema Zerdeştiyê û sirûdên wê ola pîroz. Sirûdên Gathas (Gasa) û

(Yaşt) yên ku di pertûka pîroz a Avestayê de hatine gotin, mirov dikare weku destpêka strana kurdî ya wê demê bide nasîn. Stranên ku curekî strana wê demê bûn, ji ber ku derfetên dînî hebûn, pir zû pêşde diçûn. Weku fetwaya dînî ya ku ji aliyê Mogan, rêberên dînî yên Zerdeştiyê ve hatiye dayîn, ji peyrewên dînî re hatiye ragihandin ku kî surudên Avestayê ji muzîkê re bixwîne, dê bi bandortir û baştir bigihîje armancên xwe. Peyva Gata, Gaza, Gaza yan jî Gaza bi wateya bangkirin, qîrîn, edalet û gazindanê hatiye şîrovekirin. Yanî gilî, raz û niyeta bi Xwedayê re di muzîkê de. Surud di asta hunerî de ji stranan bilindtir in û ji bo helkeftên netewî û dînî tên bikaranîn. Em pir caran dikarin rêza rastîn (pîroz) û stranên virtual (evîn, hwd.) werin dayîn. Di çaxên Zerdeştî û Kelam (Yarsan), Yarî (Ehlî Heq) û Civînên Êzdiyan de, li gel tembûra ku yek ji aletên herî pîroz ên kurdan e, surud hatine sazkirin. Sadiqî Borakî di pertûka xwe ya “Dîroka Muzîka Kurdî” de weha dibêje: Muzîk pêşî bi bilûra şivanan ketiye nav kurdan û piştre pêş ketiye. Bi giştî her sê dînên (Zerdeştî, Yarsanî û Êzîdî) ku li Kurdistanê derketine, di pêşketina stran û muzîka kurdî de bûne alîkar. Ji ber ku her sê alî teşwîq kirine ku raz û niyeta xwe bi mezin û xwediyên xwe re di muzîkê de bibêjin.
Navendên dînî ya Zerdeştiyê li Ûrmiyê, Yarsanî li Hewraman, Dalaho û Loristanê, Êzîdî li Nînova(Musil), Şengal û Amedê, hemû li Kurdistanê ne. Di Zerdeştiyê de tê gotin ger tu dua û gazincên xwe di muzîkê de bi tenbûrê bixwînî[1], zû tê bihîstin. Di dînê Yarî û Yarsanî de bi dehan gotinên pîr û rêberên wan di pertûkên pîroz ên dînî de hene ku mirovan teşwîq dikin bi muzîka bi tenbûrê ve bixwînin. Gerek em civînên zikrê yên derwêşên mezhebên Qadirî, Berzencî û Neqşîbendî yên li xaneayan ji eslê Îslamê cuda bikin. Amûrên orîjînal ên muzîka kurdî tembûr, bilûr, def, dehol û bilûr, saz û gelekên din in.
(Salihî, A, 2023, Çawî Kurd)

Di sala 1982 li bajarê Begdadê de, hemû zanayên amûrjen û amûrsazên zanista amûrên mûzîkê (Organolojî)yê, li ser wê yekdegn û kok bûn ku kevintirîn amûrên Ûdê ku mirov nas kiribe, amûrên las dirêj(Tenbûr) in. (Abdulwahîd, A, r, 13)
Em her goşeyekê vê mijarê dinêrin, digehin xalekê ku Kurdistana mezin hêlîna şaristaniyê ye ku mûzîk û hûnerê jî payeke mezin a wê şaristanyetê ye.

---

[1]Amûra Tenbûrê ku ji baweriya Mîtrayî ve weku mîrasekê maye û niha her sê dînên Kurdî “Yarsanî, Zerdeştî û Êzîdî” tevî “Elewî”yên bakurê jî ku şaxekê Mîtrayî-Yarsanî ne, Tenbûr amûra muzîka pîroz a tevan e.

Para Yekem:

Tevgerên mûzîk û hûnerê li başûr:

Piştî van bûyerên mezin ku di çaxa bîstem rûdan di ware civakî, siyasasî, leşkerî, aborî û telknolojiyê de, modernism û paş modernism bi rêya şoreşa teknolojî û berhemanînê, mirovahî û civaka mirovahiyê jî bir rahan(qonax)eke dî û mêntalîta pêşeroj û siberoj nêrînê, weha kir ku îcat, pêşdebirin û berhemanîn, ram û monopola xwastên tek û civakê guhertineke rîşeyî bi xwe ve bibîne û di bin banê kapîtalîsm û newlebralisim de seranserên jiyan careke dî tarîf bibin ku mûzîk û hûnerê jî pajeke wê bûne (Rostemzade, M.S, r, 66)

Li başûrê Kurdistanê jî mûzîk û hûner, tevger û pêşketineke mezin bi xwe ve dît û rahan bi rahan di dox(şert û merc)ên cuda cuda de bi mûzîk û hûnera xwe re bûne. Gelek kesatî, kom, Mûzîkmend û hûnermend derketin qadê di warên Meqam, Dengbêjî, Mûzîk, Heyran, Lawik/Lawje, Beste, Bend, Laylay, Surud yd..

Çend şêwazên stranên kurdî li cem me hene ku netewên derdor nekarîne ji xwe re bibin. Sedem jî ew e ku stranên weha tenê bi kurdan tên gotin ku, ev in: “Hora, Siya û çemane, Lawik yan Lawje, Heyran, Bayt, Çemerî, Soza Garmiyan”in (Salihî, A, 2023, Çawî Kurd)[2]

Komên Mûzîk û Hûnerê li Başurê Kurdistanê:

1. Koma Muzîkê ya “Melewî” komeke muzîkê ya kurdî bû ku di sala 1955an de li Silêmaniyê di bin serokatiya Qadir Dîlan de hatiye damezrandin. Ev kom wek yekemîn koma kurdî ye ku endam û dezgehên wê yên fermî hene û wek koma duyem li Iraqê tê pênasekirin. Kom heta Newroza 1963 çalak bû.

| Damezrînerên Komê: | Hûnermenên Komê: |
| --- | --- |
| Qadir Dilan | Reşol |
| Behcet Reşîd Saetçî | Heme Salih Dîlan |
| Hatemereş | Hemey Bekir |
| William Yohna | Bakûrî |
| Necatî Abde | Şemal Saîb |
| Hadî ‘Enber | Qadir Hacî Huseyin |
| Serdar Remzî Fetah | Alî Merdan |
| Qale ‘Erûs | Muhemedê Mamlê |
| Omîd Medhat Mubarek | Sêwe |
| Hazim Heddad | Îbrahîm Ahmed |
| Nûrî Bedawî | Refîq Çalak |
| Sacîd Reşafîq | Omer Reza |
| Heme Ferec | Ferec Hacî Reşîd |
| | Osman Sabûnçî |
| | Xelîl Sidqî & Bextiyar Abdulrehman |

(Suruşt Nacî. 2022, Zanyarî Side, kod, 8847)

---

[2] Hora, Siya û çemane, Lawik yan Lawje, Heyran, Bayt, Çemerî, Soza Garmiyan ta niha bi awayekî zanistî nehatine analîz û organîz kirin weku mîrasekek Kurdî

**2.** Koma Muzîkê ya “Duhok”ê komek muzîka kurdî ye ku di sala 1979an de li bajarê Duhokê yê Kurdistanê hatiye damezrandin ji aliyê mamosta “Dilşad M. Seîd” Ev kom yekemîn koma muzîkê bû ku li Duhokê hat avakirin. Yekem konsera komê di sala 1979an de li bajarê “Samawa”yê hat lidarxistin. Di sala 1989an de, di Festîvala seranserê Iraqê de pileya yekem bi dest xist. Vê komê muzîka gelêrî ya kurdî bi mûzîka rojavayî re tevlihev kir. Her wiha beşdarî gelek festîvalên din ên mezin bûne. Strana (Hoy Nergiz) ku Necat Ebdulmasîh gotiye, berhemeke Koma Muzîka Duhokê ye.

| Damezrînerên Komê: | Berhemên Komê: |
|---|---|
| Mehdî Nûrî | Hoy Nergiz |
| Arî Abdulleh | Hoy Zerê |
| Cemal Amêdî | Hoy Nazê |
| Sesret Muhemed | Lorkê |
| | Narîn |
| | Lê Lê Weso |

(Suruşt Nacî. 2022, Xaniman Side, kod, 9208)

**3.** Komek muzîka “Şinirwê”yê di 26ê Nîsana 1973an de li Helebceyê bi armanca pêşxistina huner û muzîka kurdî û dewlemendkirina folklora kurdî hat avakirin. Ev kom yekemîn koma li bajêr e. Di 14'ê Tîrmeha 1973'an de komê dest bi çalakiya xwe kir û bi Koma Şanoya Helebce re derket û 5 şevan heft stran pêşkêş kirin li bajarên “Xûrmal, Pêncwên û Tewêlle”yê. Ji sala 1974an vir ve jin di komê de weku koro yan jî dengbêj roleke girîng lîstine. Komê demekê dest ji xebatan berda û hin endaman jî bi Koma Silêmanî re berdewam kirin.

| Damezirînerên Komê: | Hûnermendên Komê: | Berhemên Komê: |
|---|---|---|
| Azad Salih | Hoşyar Hemeferec | Şîrîn û Kaban |
| Omîd Nûrî | M.Î. Abdul (Heme ûtû) | Şêrên Giyan |
| Mustefa Kemal | Azad Kerîm (Azade Reş) | Kallê |
| | Sîrwan Alî | Koç |
| | Necim Muhemed | Dêwane |

(Suruşt Nacî. 2022, Zanyarî Side, kod, 8778)

**4.** Koma Mûzîka “Baban” di sala 1980an de hat avakirin. Di sala 1983an de yekem albûma xwe li studyoyên zanîngeha Silêmaniyê tomar kirin. Narîman Baban serkêşê komê bû, armanca wan ew bû ku hunera kurdî pêş bixin, stran bi awayekî nû û taybet pêşkêş bikin. Di sala 1985 de, kom bi endamên nû re di heman salê de, strana hûnermend “Necmeddîn Xulamî” bi navê "Ferencîpoş" tomar kirn û dawî stranê jî strana “Peşîmanî”yê bû, di sala 1994an de kom hat girtin. Tam 6 albûm tomar kirin di salên “1983. 1985. 1986. 1988. 1989. 1992”

| Damezirînerên Komê: | Berhemên komê: |
|---|---|

| | |
|---|---|
| Nerîman Baban | Witim Be Dilley Hejar |
| Kawa Mustefa | Min Negorrawim |
| Kameran Mustefa | Gullalle Sûre |
| Pêşrew Xalid Reşîd | Her Weku Ney |
| Dana Xalid Reşîd | Baranî Behar |
| Aras Şêx Arif | Doktor |
| Hawdemî Flut | Desa Rêgem Biden |
| Endamên piştî 1985: | Be Serxoş im Mezanin |
| Nerîman Baba | Dîtim Le Naw Dar û Dewen |
| Serbaz Cemîl | To Hewrît û Baran Xem |
| Zanyar Şêx Nûrî | Çirax Wenewşe |
| Kawan Omer | Sozekem |
| Rizgar Osman | Her Çî Xem e |
| Sebah Cafer | Saqî |
| Bijar Dîlan | Êware ye |
| Heme Ezîz Mela Rehîm | Nazdar |
| | Jiyan û Erkî Naxoşî |
| | Were Lam & Pirsyar & Şehîd & Rûxan |

(Suruşt Nacî. 2022, Zanyarî Side, kod, 8951)

**5.** “Koma Hunerî ya Hewlêr”ê weku yekemîn koma hemerengî li başûrê Kurdistanê di 1970an de hat avakirin tê dîtin ku dirêjedara koma Dersîmê bû. Kom ji beşên mûzîk, şano û nîgarsazî pêk dihat. Para mûzîkê ya Koma Hunerî ya Hewlêrê di salên 1970î de çendîn stran ji bo hunermendan li Hewlêr, Silêmanî û Koyê tomar kirine. Di sala 1978'an de yekem strana xwe ya rengîn tomar kir, bi giştî 21 berhemên rengîn tomar kirin.

| Damezrînerên Komê: | Hûnermendên Komê: | Berhemên Komê: |
|---|---|---|
| Cemal Hîdayet | Tahîr Tofîq | Bilwêrî Şuwan |
| Tehdsîn Teha | Heme Ceza | Kejall |
| Wahîd Mercan | Qadir Kaban | Perîşan im |
| Mustefa Reûf | Îbrahîm Sabîr | Hez im lêkirduwî |
| Sebah Abdulrehman | Selah Muhemed Koyî | Bo derroy Ey Nazenîn |
| Sultan Abdulleh | Cafer Selîm | |
| | Tenya Areb Osman | |
| | Nîzam Şikur | |
| | Cebar Ahmed | |
| | Sabîr Abdulrehman | |
| | Kawa Jajlleyî | |
| | Resûl Bêzar Gerdî | |
| | Celal Seîd | |
| | Saman Kerkûkî | |

(Suruşt Nacî. 2022, Zanyarî Side, kod, 8874)

**6.** Koma muzîka Bawacî[3], komek muzîka kurdî bû ku di sala 1957an de li bajarê Koye'yê bi rêvebiriya "Andreas Xemo" hat damezrandin. Kom di serî de koma muzîkê ya debistana Koye'yê bû ku dûre di sala 1958an de bi navê Koma Bawacî derket û di 27ê Adara heman salê de yekemîn konsera xwe li debistanê li dar xist. Di 1'ê Adara 1972'an de "Zahîr Muhemed, Enwer Tahîr û Serdar Ahmed" destûra fermî ya komê wergirtin. Ji sala 1972 heta 1974 nozdeh berhem li Bexdayê û heşt jî li televizyona Kerkûkê tomar kirin. Di sala 1974'an de piştî ku piraniya endamên wê tevlî Şoreşa Eylûlê bûn, ev kom ji aliyê îraqê ve hat girtin. Di sala 1983an de careke dî vebû û dest bi çalakiyên xwe kirin.

| Endamên Komê: | Hûnermendên Komê: | Berhemên Komê: |
|---|---|---|
| Serdar Ahmed | Guşad Mîrza Kemal | Helaw Helawe |
| Zahîr Muhemed | Nuwa Nehro | Şewêkî Yellda |
| Îbrahîm Ferecûlleh | Şino Îbrahîm | Xem |
| Hemîd Îsmaîl | Heme Begrez | Kiçe Şoxeke |
| Ekrem Baqî | Îbrahîm Sabîr | Lem Kollbey Ehzana |
| Ewnî Alî Mewlûd | Şewket Reşîd | Bom Billê Toze Toze |
| Neşeed Hemîd | Selah Piştderî | Esmeran |
| Kakemem Qadir | Diyarî Berzingî | Meryem |
| Wirya Qadir | | Kallê Hey Lîmo |
| Ekrem Enwer | | Bo Xemnakî |
| Enwer Tahîr | | Pa be Mûrû |
| | | Mîletanî Rûy Zemîn |
| | | Lêmgerrê |
| | | Hermê |
| | | Bizmare |
| | | Încaney Şîîr |
| | | Eger Demzanî |
| | | Bimbexşe |
| | | Ey Gull |
| | | Yadî Caran |
| | | Dill û Gerdûn |
| | | Kanî Ewîn |
| | | Bûkî Kerkûk |
| | | Rengî Zerd im |
| | | Kiçî Mehabadî |
| | | Melengêne |
| | | Biryar |
| | | Bo Firrînî |

(Suruşt Nacî. 2022, Zanyarî Side, kod, 8973)

---

[3]Bawacî navê çiyayeke li kêla Koye'yê

**7.** Koma muzîkê ya “Bêkes” komeke muzîka kurdî bû ku di sala 1958an de li Kerkûkê hat avakirin. Vê komê sirûdên kurdî pêşkêş kirin û di şahî û dawetan de derketin ser dikê. Kom li Kurdistanê gelekî navdar bû, heta sala 1969an çalak ma û di dawiyê de bû bingehê avakirina Koma Solav.

| Damezirînerên Komê: | Endamên Komê: |
|---|---|
| Remezan Zamdar | Serdar Fetah |
| Abdulîlah Mehyedîn | Qadir Merdan |
| Selah Abbas | Şewket Reşîd |
| | Tayer Necim |
| | Selah Serac |

(Suruşt Nacî. 2022, Zanyarî Side, kod, 9165)

**8.** Koma Mûzîka Xanzad di sala 1980an de bi serguzariya “Wirya Ahmed” li bajarê Hewlêrê hat avakirin weku yekemîn koma mûzîkê tê dîtin ku tevhaiya wan jin bûn. Di sala 1982an de Koma Xanzad beşdarî Duyemîn Festîvala Hunera Kurdî li Hewlêrê dibe. Di sala 1983an de çend stran ji televizyona Kerkûkê re tomar kir. Di şerên di navbera Îraq û Înranê de, hikumet daxwaz kir ku koma Xanzad surud ji bo arteşa îraqê bibêjin, mamosta “Wirya Ahmed” qebûl nekir û ji komê derket û ew bû sedema ku kom bê girtin.

| Endamên Komê: | Berhemên Komê: |
|---|---|
| Şe’ai’ Fayeq – Org | Hey Mîne Emr im Mîne |
| Sozan Fayeq – Keman | Hop Zindan û Hop Zindan |
| Rêzan Hemîd – Keman | Dek Nemînêm Elerze |
| Viyan Qasim – Klarnêt | Ayşokê Delalê di bila wabê her wabê |
| Nadiye – Accordion | W-ez Taze me |
| Sozan Hemîd – rhythm(Rîtîm) | Xan Emîrî |
| Serab – Gîtar | Peşîmanî – Kors |
| Werde – Def Naske Îzzedîn Meheydîn – Flut | |
| Viyan Fayeq – Gîtar & Stranbêj | |

(Suruşt Nacî. 2022, Zanyarî Side, kod, 9163)

**9.** Koma muzîkê Kawa komeke muzîka kurdî ye ku di sala 1983an de li bajarê Hewlêrê, Kurdistanê bi serguzariya “Seyd Ahmed Berzingî” hat avakirin. Komê gelek berhm li televizyona Kerkûk û Mûsilê tomar kirin û di gelek boneyên neteweyî de derketin ser dikê.

| Endamên Komê: | Hûnermendên Komê: |
|---|---|
| Necmedîn Babekir | Tenya Areb Osman |
| Celal Şakir | Burhan Xoşnaw |
| | Saman Birîfkanî Mîran Herkî |
| | Şêrzad Abdulehman |
| | Celal Perîşan |

(Suruşt Nacî. 2022, Zanyarî Side, kod, 8940)

**10.** Koma muzîkê ya “Bêxud” komek muzîka kurdî ye ku di 20ê Gulana 1977an de li Dibistana Bêxûd a bajarê Silêmaniyê, bi serguzariya “Namdar Qeredaxî” hat avakirin. Kom ji çil zarokên neh heta yanzdeh salî pêk dihat, bîst ji wan li kemanê dixistin. Armanca komê ew bû ku zarokên kurd di warê muzîk, civakî û netewî de perwerde bikin. Piştî dabînkirina amûrên mûzîkê û dawîbûna kursê, komê dest bi çalakiyên xwe kir, di 1ê Cotmeha 1977an de roja yekem a muzîkê li salona çalakiyên debistanê hat lidarxistin. Ji bilî tomarkirina berhemên bêhempa, vê komê di gelek festîval û koran de beşdar bû û çendîn xelat li Kurdistan û Iraqê bi dest xistin, her weha çendîn berhem li Televîzyona Kerkûkê tomar kirin. Ji sala 1979 heta 1980, bi alîkariya Koma Mewlewî ya Debistana Bêxûd, bi dizî yanzdeh surud û çar meqaman ji bo hûnermend “Naser Rezazî” tomar kirin ku mamaosta “Azad Şewqî” roleke girîng di pêşxistina komê de lîst. Dûre bi Koma “Newroz” û Koma “Şêx Mehmûd” Koma Zarokan a Silêmanî ava kirin.

| Endamên Komê: | Berhemên Komê – Surud: |
|---|---|
| Alan Arif Abdulle | Ey Şehîdan |
| Arî Arif Abdulleh | Min Pêşmergey Kurdistan im |
| Pako Alî Abdulleh | Karger în Cengawer în |
| Dilêr Abdulleh Abdulqîf | Wirr û Kas û Sergerdan im |
| Beyad Muhemed Emîn | Sedey Bîstem |
| Karwa Qadir Mustefa | Daye Mallawa |
| Arî Abdulleh Sabîr | Demî Raperîn e |
| Cotyar Alî Abdulleh | Hîwa Hîwa |
| Peycur Alî Abdulleh | |
| Soran Hemeşerîf | |

(Suruşt Nacî. 2022, Zanyarî Side, kod, 9098)

**11.** Koma Muzîkê ya “Aware” komek muzîka kurdî bû. Di sala 1982’an de li Amsterdamê bi serguzariya “Namdar Qeredaxî û Salar Qeredaxî” hat avakirin. Ev kom di danasîna çand û nasnameya kurdî de bi cil û berg, dîlan û muzîka kurdî gelek çalak bû. Di sala 1983'an de kaseteke neteweyî û hunerî derdixe. Di heman salê de bi boneya salvegera Komara Kurdistanê konsertek li dar dixe. Her weha bi koma muzîka “Z.X”a Holandî re berhemeke hevbeş pexş dikin.

| Endamên Komê: | Berhemên Komê: |
|---|---|
| Şoreş Qeredaxî | Kurdayetî |
| Karwan Qeredaxî | Yekêtî |
| Karzan Qeredexî | Dastanî Şehîdêk |
| Şoreş Omer | Zoran |
| Salar Selman | Kakî Bira Ho Xuşkî Kurd |
| Jorj ‘Aşûtî | Her dêynewe |
| | Hîwa Serkewtinmane |

(Suruşt Nacî. 2022, Zanyarî Side, kod, 8907)

**12.** Koma Muzîkê ya "Pîramerd" komek muzîka Kurdî ya debistanan bû ku di sala 1977an de bi serguzariya "Selah Reûf" hat avakirin. Kom ji du dibistanên keçan û sê debistanên kuran pêk dihat ku nêzî şêst endamên wê hebûn. Kom di serî de dersên muzîkê dida zarokan, lê dûre bû komeke populer a serdema xwe û heta sala 1991an ma. Piraniya endamên wê dûre di Koma Suleymaniyê de dirêje dan.

Berhemên Komê:

Êwarey Payîz
Ay Lew Befre Barîwe

(Suruşt Nacî. 2022, Zanyarî Side, kod, 8900)

**13.** Koma Muzîkê ya "Paşay Gewre" komek muzîka kurdî ye ku di 1ê tîrmeha 1977an de li Rewandizê, li Kurdistanê hat avakirin. Ev kom pajek ji Komeleya Huner û Wêjeya Kurdî bû ku di heman salê de li Rewandizê hatibû avakirin. "Zirar Muhemed Mustefa" serokê vê komeleyê û damezrînerê Koma "Paşay Gewre" bû. Komê bi giştî 75 berhem tomar kirin û karîbû di beşa muzîka cîhanê de weku orkestra derkeve ser dikê. Behcet Yehya, Ednan Kerîm û Razaw bi vê komê re yekemîn berhemên xwe tomar kirine.

| Endamên Komê: | Hûnermendên Komê: | Berhemên Komê: |
|---|---|---|
| Zirar Muhemed Mustefa | Şîrîn Perwer | Hoy Narê |
| Ahmed Şêxe Huseyin | Şivan Perwer | Ey Yara min |
| Zeynel Xeyrî | Nasir Rezazî | Zembîl firoş |
| Muzefer Abdulleh Xidir | Necmedîn Xulamî | Koçerê |
| Îbrahîm Hesen Xidir | Fatîme | Mendane |
| Welî Hesen Doskî | Hawta Es'ed | Dunyaye zor ciwan e |
| Suleyman Ahmed Ezîz | Ebubekir Lezgî | |
| Ezîz Şakir Seîd | Ahmed Muhemed Şerîf | |
| Nî'met, Farûq, Tariq Bapîr Nî'met | Xidir Bêcanî | |
| Xidir Feqê Ewla(Bêcanî) | Selam Muradî | |
| Karox Zirar Suleyman | Saman û Selam | |
| Saman Alî Murad | Suleyman Ahmed Ezîz | |
| Sîrwan Sîrînî | Welî Doskî | |
| Şêrzad Ekrem Heyderî | | |
| Şuwan Abdulleh Elyas | | |
| Çeto Salih | | |
| Rizgar Sebrî Necim | | |
| Ahmed Muhemed Şerîf | | |
| Yusif Omer Yusif | | |
| Ayub Nûrî Bawîl axa | | |
| Seyd Ahmed Seyd Cebar | | |
| Amanc Xazî Şakir | | |
| Rêbuwar Nûrî Seîd | | |
| Selam Alî Murad | | |

(Suruşt Nacî. 2022, Zanyarî Side, kod, 8885)

**14.** Koma Muzîka “Hawnaz” Komek muzîka Kurdî ye ku di sala 1982an de ji aliyê “Hêriş Fewzî” ve hat avakirin. Yekem albûma komê “Bafr Ebarê” bû, ku di sala 1983an de derket. Koma Hawnaz heta sala 1991ê çalakiya xwe berdewam kir û berhema wan a dawîn “Xemî Şawe” ya Kemal Muhemed bû ku di heman salê de derket. Di dawiya salên heştêyan de, Dilêr Fewzî bû berpirsê komê, Kemal Mihemed çû derve. Hêriş Fewzî hate girtin. Piraniya stranên Mustefa Reûf û Medya Huseyin ji aliyê Koma Muzîka Hawnazê ve hatine tomarkirin.

| Endamên Komê: | Berhemên Komê: |
|---|---|
| Hêriş Fewzî | Befir Ebarê |
| Dilêr Fewzî | Xerîbî Şar |
| Şaho Fayeq | Denwê |
| Kurde Sabîr | Perçemit Çîn Be Çîn e |
| Merîwan | Cemal Saqiye |
| Mîdya | Huseyin Nasik |
| Kemal Muhemed | Xemî Şewe |
| Salar Mehmûd | |
| Zahîr Celal | |
| Mustefa Reûf | |

(Suruşt Nacî. 2022, Zanyarî Side, kod, 8873)

**15.** Koma muzîkê ya Zanîngeha Suleymaniyê, ku berê bi navê “Kardo”yê dihat nasîn, komek muzîka kurdî bû di sala 1975an de ji aliyê “Enwer Qeredaxî” ve li Zanîngeha Suleymaniyê hat avakirin. Komê muzîka rojavayî bi folklora kurdî re tevlihev kir û gelek stran bi stayla “Caz” nûjen kirin, ew bi xwe test û muzîkên stranên xwe çê dikirin. yekem albûm di sala 1977an de bi şeş stranan derxistin. Ev grûp heta destpêka salên heştêyan çalak ma, dûre ji aliyê hikûmeta wê demê ya Iraqê, ji ber çalakiyên siyasî hat hilweşandin. Di sala 1976an de di çarçoveya Koma Muzîkê ya Zanîngeha Suleymaniyê de bi rengeke mîlî heman kom ji nû ve hat avakirin.

| Endamên Komê: | Berhemên Komê: |
|---|---|
| Enwer Qeredaxî | Heware |
| Macîd Mustefa | Çawekem |
| Serkewt Cemal | Yaran Le Cerg im |
| Kawa Heme Emîn | Leyla |
| Farûq Tahir | Zor Qijî Zerd |
| Sidîq Selahedîn | Baran Baran e |
| Harût Sine Kerîm | Baxewan Giyan |
| Kamîl Mustefa | |
| Bijar Celal Hemdî | |
| Nejad Osman | |

(Suruşt Nacî. 2022, Zanyarî Side, kod, 8837)

**16.** Koma muzîkê ya folklora kurdî (Kurdish Folklore Musical Band) komek muzîka kurdî bû di 1994an de at avakirin. Berhemên yekem ên komê "Bêkesî, Bo Ewîn û Ahengî Ruh" bûn. Koma muzîka gelêrî ya kurdî ji gelek hunermendên wê demê re stran tomar kir û karî gelek hunermendên wek Eyûb Elî û Saman Omer perwerde bike. Komê gelek festîvalên xwe yên stranan jî li dar xistine.

| Damezirînerên Komê: | Hûnermendên Komê: | Berhemên Komê: |
|---|---|---|
| Sebahê Sentûr | Sabîr Kurdistanî | Bêkes |
| Huseyin Hemedemîn | Îbrahîm Xeyat | Bo Ewîn |
| Dana Xenî | Zahîr Celal | Ahengî Ruh |
| Sebah Şêxanî | Mehmûd Muhemed | Xom Be Xullamî |
| Ferhan Muhemed Salih | Merîwan Sefaedîn | Ba Aram Bê |
| Xalid Mecîd Ferec | Cemal Şerîf | Henaseyek |
| | | Diyem |
| | | Felek |
| | | Gull Meryem |
| | | Bêzarî Jîn |
| | | Babirdelle |
| | | Baranî Şew |
| | | Kizey Cergan im |
| | | Ewîn |

(Suruşt Nacî. 2022, Zanyarî Side, kod, 8824)

**17.** Koma muzîkê ya zarokan a Suleymaniyê komeke muzîkê ya zarokan bû[4] li bajarê Suleymaniyê di sala 1976–1977an de ji aliyê "Osman, Namdar û Dilêr" ku endamên koma muzîka zarokan a Newroz, Bêxud û Şêx Mehmûd bûn, Koma Muzîka Zarokan a Suleymaniyê ava kirin. Kom ji serîn ve beşdarî festîvalên herêmî yên li Kurdistan û Iraqê bû.

| Endamên Komê: | Berhemên Komê: |
|---|---|
| Karzan & Ferman Omer Salih | Çend Şîrîn e Lam |
| Azad Omer Qadir | Ey Dilêran |
| Rêbuwar Muhemed Îsa | Wa Weten |
| Zana Mehmûd Hejar | Ey Niştiman |
| Ako & Amanc Omer Soran | Ey Topeke |
| Ciwanro Omer | Berxekem |
| Ako Muhemed Emîn | Gidî Gidî |
| Arî Qadir Birsî | Ho Bira |
| Dilşad Teha | |
| Dilêr Abdulleh | |

(Suruşt Nacî. 2022, Zanyarî Side, kod, 8825)

[4]Sibeha roja 17.04.1978ê ew kom bi 5 otobusan ji Suleymaniyê ber bi Hewlêrê ve bi rê ketin û beşdarî festîvalekê bibin. Li nêzî Kerkûkê rastî qeza tên ku Karzan Kemanjen, birayê wî Fermanî akordeyonjen, Rêbwar bangojen û Azad korojen, can didin

**18.** Koma muzîkê ya "Şehîd Karzan" komeke muzîka şoreşger a Kurd bû, di sala 1981'an de ji aliyê "Aras Îbrahîm" ve di dema şoreşa Kurdan a li dijî rejîma Baasê de hat avakirin. Ev kom bi navê şehîd Karzan Omer û sê hevalên din ên şehîd ên Koma Mûzîka Zarokan a Silêmaniyê bû. Çalakiyên komê li çiya û di nava şer de bû û tevî astengiyan jî gelek stran û surud tomarkirin ku piraniya wan bi naveroka xwe netewî bûn. Koma Şehîd Karzan heta sala 1990'î berdewam kir û di vê heyamê de bi giştî 53 berheman tomarkirin[5].

| Endamên Komê: | Berhemên Komê: |
|---|---|
| Aras Îbrahîm | Şehêd |
| Dilêr Îbrahîm | Şehîd Aram |
| Hoşyar Ahmed | Daye Mallawa |
| şuwan Kaban | Bîrtan Dekem |
| Rizgar Îsmaîl | Billên Bew Bûkî Taze Yek Şewem |
| Salar Ahmed | Eger Gull Bay |
| Tuwana Suleyman | Bo To Alltûn |
| Aso Kakeyî | Sinûr |
| Berzan Kerîm Kaban | Azadîxway Kurdîn Ême |
| Dilşad Mustefa | Kellkî Qeywan |
| Hemeceza Alî | Raçillekîn û Wirya Bûyin |
| Azad Xaneqînî | Nîştîman Selam |
| Selam Ahmed Reza | Meterêzî Şeref |
| Abdulqadir Hesen | Ho Kakî Pêşmerge |
| Siyar Bamerrnî | Hêdî Hêdî |
| Celal Ezîz | Asûde bin |
| Mecîd Xoşnaw | Asman Ellê |
| 'Eta Hacî Alî | Ey Weten |
| Ako Mehmûd | Bo Cêm Dêllî |
| Ferhad Mela Resûl | Daye Daye |
| Qûbad Mela Resûl | Le Dûrewe |
| Azad Çalak | Hemû Nebîn |
| Kawa Muhemed | Hey Naye Naye |
| Bextiyar Omer | Be Lence |
| Burhan Muhemed | Babe Merro |

(Suruşt Nacî. 2022, Zanyarî Side, kod, 8803)

[5]Yek ji taybetmendiyên Koma Mûzîkê ya Şehîd Karzan ew bû ku piranî berhemên xwe li çiya berhemanîn.

**19.** Koma muzîka “Solav”ê komeke Kurdî bû, di sala 1969an de li bajarê Kerkûkê hat avakirin. Di vê salê de, yaneya Solavê ya Werzîşî destûra fermî wergirt û ji Koma Bêkas xwest ku di bin çavdêriya yaneya Soalvê de karê xwe yê hunerî berdewam bike. Çalakiya yekem a komê bernameya Newrozê ya wê salê bû li Kerkuk TV û surudên “Ey Raqîb”, “Kurdistan Niştimanî Ciwan” û “Newroz”ê pêşkêş kirin. Cejna xwe ya herî mezin di 11'ê Adara 1970'an de li herêma “Hasar”ê pêk anî. Komê xizmeteke mezin ji bo stranên resen a Kurdî kirin û di hemû çalakiyên neteweyî de beşdar bûn. Herweha roleke berçav di perwerdekirina hunermendên Kerkûkê de hebûN. Di sala 1975’an de ji ber şoreş û zextên rejîma Îraqê ev kom hat girtin.

| Endamên Komê: | Berhemên Komê: |
|---|---|
| Remezan Zamdar | Bexêr Bênewe |
| Şewket Reşîd | Ejîn |
| Qadir Merdan | |
| Beyan Ezîz | |
| Qasim Hemed | |

(Suruşt Nacî. 2022, Zanyarî Side, kod, 8790)

**20.** Koma Muzîkê ya Şoreş komek muzîka kurdî bû, di sala 1974an de hat avakirin,  Piraniya endamên Koma Suleymanî, Koma Bawacî ya Koyê û beşek ji hunermendên Hewlêrê ji bo piştevaniya têkoşîna gelê Kurd û handana Pêşmerge di şoreşa Îlonê de li çiyayan ev kom ava kirin. Ji bilî tomarkirina gelek stranên bêhempa ji bo Radyoya Dengê Kurdistanê, ji bo Pêşmerge û malbatên wan û herweha ji bo penaberên Başûrê Kurdistanê yên li Rojhilat derketin ser dikê. Stranên hûnermendê Kurd “Kerîm Kaban” weku “Yaran Wesiyetem” û “Şaw” li gundê Wasanê ji aliyê Koma Muzîkê ya Şoreşgerî ve hatin tomarkirin.

| Endamên Komê: | Hûnermendên Komê: | Berhemên Komê: |
|---|---|---|
| Enwer Qeredaxî | Kerîm Kaban | Min Pêşmergey Kurdistanim |
| Xalid Serkar | Osman Alî | Kurdistan Nîştşîmanî Kurd |
| Selah Reûf | Hesen Germiyanî | Kurdistan Nîştîmanî Ciwan |
| Osman Muhemed Emîn | Resûl Gerdî | Ême Roley Kurdîn |
| Rencber Xoşnaw | Fûad Ahmed | Ême Kurdîn |
| Wirya Ahmed | Abdulrehman Zengene | Kurd im em in |
| Cenan Qustentîn | Cemîl Duhokî | Ey Kurdî ne |
| Dilêr Îbrahîm | Remezan Zaxoyî | Pêşmergeyin û Kollneder |
| Serdar Ahmed | Es’ed Qeredaxî | Be Kurdî kewa Ziman im Pija |
| Elbrêd Îsa | Omer Xezan | Ew Şehîdaney Xwênyan Rija |
| Ferîd Îsa | Îbrahîm Sabîr | Şehîd |
| Necmedîn Kerkûkî | Îsmaîl Wendî | Aware |
| Fereydûn Dartaş | Cîhanbexş M. Koyî | Demî Reperîn |
| Frensîs Dawud | Necmedîn Enter | |

(Suruşt Nacî. 2022, Zanyarî Side, kod, 8760)

Jin di muzîk û hûnera Kurdî – Başûr de:

Li başûrê Kurdistanê piştî par par bûna niştimên, ew para başûr ku kete ser dewleta nû ya bi navê îraqê, Kurd rastî gelek êş, komkujî û wêraniyê hatin ku barê mezin kete ser jinan, lê dîsan jî jiyana kurdan ranewestî û bi her reng û dengên xwe ve berxweda ku qata mûzîk û hûnerê jî payekê mezin di vê qadê de digirt. Mil bi milê mêr, jin jî serbarê rewşa civakî, dînî, siyasî û kevneşopiyê, ketin qada xebatên mûzîk û hûnerê bi taybetî di komên mûzîk û hûnerê de ku bajarê Suleymaniyê di vê warî de pêşneg bûn weku "Koma Mûzîka Suleymanî, Koma Mûzîka debistana Suleymanî ya Keçan, Koma Mûzîka Pîremêrd, Koma Mûzîka Newroz" gelek kom û girohên din.

Li gor qada mûzîk û hûnerê û rolên mêr, rolên jin kêmtir bûn, ew jî ji ber çendîn sedemên ku me li jor amade dan. Di salên çilan de çend jinên hûnermend û mûzîkjen peyda bûn li radeoyan de strîn weku "Meryem xan, Nesrîn Şêrwan, Ayşe Şan, Nazdar, Esmer, Dayika Cemal, Gulbehar" yd.. bûn[1] Her weha di sala 1970 hejmarek ji jinên din ketin qada mûzîk û hûnerê, ji wan jî "Jiyan Alî, Kelsûm Ahmed, Ayşe Resûl û Semîre Nadir"[6]

Yekemîn jin ku bi zarê Kurmanciya navîn anku Soranî striye "Dayika Cemal" bû ku li ser gramafonê haiye tomar kirin. Dû re "St Almas" di sala 1945 li radeo nêzî 200 stran striye, lê mixabin gelek ji wan nehatine tomar kirin.
(Xidid Huseyin. S, r, 2)

Di sala 1980 de li bajarê Duhokê hûnermendê navdarê Kurd "Dilşad M.Seîd" komeke mûzîk û hûnerê ava kir ku hemû endamên komê jin bûn di strîn, koral, kurs û jendinê de weku mînakên "Necat Abdulmesîh, Munî Sebrî, Alam Tahir"

Her weha di salên heşêyan de li bajarê Hewlêrê, Koma Mûzîka Hewlêrê bi serguzariya Hûnermendê navêdarê Kurd mamosta "Wirya Ahmed" komek ava kir ku çendîn jin tevlî wê komê bûn ji wan jî "Viyan Fayeq, Weten Alî, Sozan Fayeq û Suham" ku çendîn stran tomar kirin di telefîziyona Kerkûkê ji wan jî "Xane Mîrî, Dek Nemênim, Hey Mîne, Ho Bezendan" û çendîn stranên din
(Xidid Huseyin. S, r, 2)

Di sala 1977 de bi serguzariya mamosta "Zirar M.Mustefa" koma mûzîk û hûnerê li bajarê Rewandizê hat avakirin ku çendîn jin têde cî girtin, ji wan jî hûnermendan "Saman Alî Murad, Sirwe M. Emîn, Çinar Ahmed, Emel Abdulxaliq, Dilsoz Celal, Perwîn Fetah, Jiyan Abdulleh, Jiyan Alî" ku di wê heyamê de çendîn stranên folklore tomar kirin[7]. (Xidid Huseyin. S, r, 3)

Di sala 1980 û şûn de çend hûnermendên din peyda bûn weku "Zulîxa[8], Çiro Celal û Xelat Xalid Dilêr[9]"

---

[6]Ji wan hûnermendên dengbêj, hin ji wan ji bakurê Kurdistanê bûn yan jî ji dever û hermên din bûn, ji xencî başûrê Kurdistanê

[7]Serbarê rewşa civakî û siyasî jî, lê bi aliakriya çend hûnermendên bernas, van jinên Hûnermend bûne pêşengên jinên hûnermend li başûrê Kurdistanê

[8]Zulîxa stranên mîlî digot anku devok, lê di wê demê de rola wê berçav bû

[9]Xelat Xalid Dilêr çendîn stran strî, lê zû dev ji stran gotinê berda û winda bû

Di sala 1986 de koma muzîka Dîlan hat avakirin bi serguzariya hûnermend "Frensîs Davud" ku girêdayî çalakiyên debistanan bû. Li hemû festîvalên Kurdistan û îraqê beşdar didûn. Koma Dîlan pileya yekemîn bi destanîn bo heyama 5 salan li ser hev li bajarên “Begdad, Hewlêr, Kerkûk, Suleymanî û Duhok”ê. (Xidid Huseyin. S, r, 3)




*Koma Mûzîka Xanzad a Jinan – Wêne ji Googlê hatiye girtin*

Di sala 1955 de avakirina “Koma Mûzîka Mewlewî”yê ku roleke mezin dît. Dûre di sala 1969 de “Koma Mûzîka Suleyamanî”yê destûr stand ku çendîn jin têde cî digirtin. Dûre “Koma Mûzîka Newroz û Koma Mûzîka Pîremêrd” jî hatin avabûn û ew jî çendîn jin têde cî digirtin û karîn xizmeteke baş pêşkêş bi mûzîk û hûnera Kurdî li başûrê Kurdistanê bikin. Dûre di sala 1989 de para muzîka komeleya hûnerên ciwan ên Kurd hat avabûn ku ew jî çendîn jin weku jenyar têde cî digirtin ji wan jî “Telar S. Azîz, Dalya Letîf û Şîlan Osman” bûn. “Rêzan O. Reza” jî yekane stanbêj bû. (Xidid Huseyin. S, r, 5).

Yekemîn jin ku dest da amûrê û bû mûzîkjen “Mîxaîl Yunan”[10] bû ku jenyara amûra Ûdê bû. Yunan di sala 1929 de li bajarê Nînova(Musil)ê dêbûye û d sala 1968 de bo cara yekem dest bi jendina amûra Ûdê kir. (Xidid Huseyin. S, r, 7).

Di Sala 1973 de her weku li jor jî amaje bûye, koma muzîka Şinirwê li bajarê Helebceyê, gelek jin weku koro tevlî komê bûn û cîyekî giring girtin di komê de.

Koma Mûzîka Xanzad di sala 1980an de bi serguzariya “Wirya Ahmed” li bajarê Hewlêrê hat avakirin weku yekemîn koma mûzîkê tê dîtin ku tevhaiya wan jin bûn. (Vegere rûpela 10)

[10]Hûnermend “Mîxaîl Yunan” xanimeke xiristiyanî bû ku xizmeta mûzîk û hûnera Kurdî dikir

Para Duyem:

Mûzîk û Hûner li Hewraman – Başûr:

Hewraman hem weku erdnîgarî, hem weku dîrok, hem weku bawerî û hem jî weku hûner û wêje, xwedî taybetmendî û dewlemendiyeke bêhemap ye. Hûnera Hewramanê bi her du “Hore û Siyaçemane”ya xwe navdar e ku du rîtîm û meqamên taybet bi Hewramanê ne. Helbet Hewraman piştî parçe kirine Kurdistanê, ew jî bû du parçe, parçeya Rojhilat (Hewramana Text) û parçeya Başûr(Hewramana Sext) e. Li Hewramana Başûr-Sext ligel rewt û refa mûzîk û hûnera başûrê, ew jî di qada mûzîk û hûnerê de gelek berhemên mezin û zengîn pêşkêş bi gelê Kurd û Başûrê Kurdistanê kirine. Gelek hûnermend û hûnerhezên Hewramanê hene ku cî destê wan xuya ye di qada hûnera Kurdî de. Em navê hin ji wan dinivîsin ku roleke berçav dîtin ji wan jî:

“Mehmûd(XûleSûr), Hacî Hemereş, ‘Ebe Tepereş, Heyder, Ehemdî Nazdar, Heyderî Şuwan, Heme Selîm, Heme Alî, Nesrulleh Keykaus, Sabir Bêrwasî, Heyderî ‘Ebabeylê, Marûf Abdulrehman, Mehmûd Şîranî, Hacî Ezîz, Heme Salih Tewîlleyî(Hete), Hesen Rehman, Hemey Birzûm, Ahmed Mazîbî, Arif Bindireyî, Seîd Zelamî, Hemexan Gullpî, Heme HaneGermilleyî, Huseyin Narinclley, Alî Newsûdî, Hesenbegî Durro, Heme Alî Xawer, Heme Caferî Nodşî, Heme Huseyin Xalidî Keymine, Şefî’ Xalidî Keymine, Mecnûn Xalidî Keymine, Yaqoy Xalidî Keymine, Muhemed Xalidî Keymine(Heme Qulte), Muhemed Mîrzayî Keymine(Heme Tene), Hekîm Abasî Keymine(Mamo Hekîm), Rehman Xalidî Keymine(Rehmane), Muhemed(Heme Qîjelle), Fars Xalidî Keymine, Abdulleh Abasî Keymine, Beyza Xalidî Keymine, Ferxî Xalidî Keymine, Meryemî Dayikim, Ode Şemse, Rehîm Hemereşî Bêrwasî, Fethulleh Emînî Cuwanrroyî, Celal Hersînî, Cemîl Newsûdî, Kamîl Newsûdî, Heme Newsûdî(Hemelle), ‘Eta Zellmî, Newzad Hanedinî, Semîn Nigllî, Xusrew Caf, Muhemed Mazî Binî, Hememîn Xwaştî, Hemexanî Bellxeyî, Alî Tewêlleyî, Alî Gullpî,Tewfîq Zawerî, Muhemed Pilîs Keymeneyî, Qûrbanî Xalidî, Heyran Xalidî, Eşref Yususfî Dizawer, Se’dî HaneGermilleyî, Murad Keymineyî, Kerîme Siyaw, Rostem Kerîmî, Ferec Mîrzayî, Ahemdî Ezîzî(Seher), Heme Salih Fetahî Zade, Emîn Demeyewî, ReşeXullam Ahmedawayî, Fatimexan Billberî, Sîrwan Arif, Cîhanbexş Şoşmeyî, Omer Şoşmeyî, Sabir Şiyanî, Sebah Xerpaneyî, Mewlûd Şoşmeyî hwd…. (Abasî, C, r, 21,22,23,24)

Hore: Hore curek dengbêjî ye ku taybet e bi Hewraman, Germiyan, şehrezûr, Loristan û bi tayebtî di nav dînmendên Yarsanî de.

Nî’met Zehmetkêş di hevpeyvîna Rûdaw Tv de derbarê Hore dibêje: Ji hengî ku mirov li şikeftan de jiyane, Hore heye. Tam demek diyar nake ku ji kengî ve Hore heye, lê di metnên Yarsanî de zêdetir ji hezar Sal e, Behsa Hore heye. Her weha tekez dike ku berê 72 meqamên Hore hebûne, lê tune bûne. Hore hesteke dengî ye di navbera Mirov û xweza, di nav bawermednên Yarsanî de Horeb o stayiş û pesnên Pîran tê vegotin. Hore bi sê zaraveyên Kurdî tê xwendin, ew jî “Hewramî, Soranî, Kelhûr-Lek-Feylî, Îlamî û Kirmaşanî” yd… ne. Niha Hore zêdetir bo wesfa Xweda û dua û stayişa Xweda tê vegotin. Her weha tekez dike

ku Siyaçemane bi mûzîk yan çepikê bê vegotin, lê Hore tenê deng e û Hore dengê ruh e bi mirov xwe re. (Zehmetkêş, N, Rûdaw Tv, 2022)

Hore vegotineke li jêr lêv tê gotin. Hore di nava Cafî, Hewramî, Yarsanî, Feylî û Germiyanî û her weha di xwendina "Gata"yên Avestayê ya dînê Zerdeştiyê de roleke mezin dîtiye (Ferhenga Anahîta Site)

Dîroknasan Hore bo dema dînê Mêhrî anku Mîtrayî ya Zagrosî ku hinek bi zêdetir ji çar hezar sal û hin bi zêdetir ji pênc hezar sal û hin jî bo demeke pir kevintir jî vedigerînin. Gas(Meqam)ên Hore di niha de weku "Saroxanî, Sehre, Serkoçer, Qetar, Suwar Suwar û Dudengî yd.. ku piranî ji bo evîn, xem, şadî û hemas û kelecanî tê vegotin. Lê cureke Hore heye ku jêre dibêjin "Mûr" ku li ser mirî tê vegotin. Di xwendina Horeyê de jinên Kurd jî roleke mezin dibînin û hore dibêjim, ji wan jî "Aho, Nîgar, Reyhan û Esrîn" ku mînakên wan Horebêjan in. Ji Horebêjan "Goreçirr" tê gotin. (Kurdşop, 2024)

SiyaÇemane: Muhemed Rehmanî dibêje: 660ê berî Zayînî SiyaÇemane di Gatayan Avestayê de hatiye xwendin. Hin kes dîroka wê vedidigerînin dema "Xusrew Perwêzî" yê şahê Sasanî dema ku tê Hewramanê nava çiya û dest û newalan, ji "Barbodî" re dixwaze ku sedayek bibêje mîna dengê Kew û xweayê be, ew jî vê sedayê SiyaÇemane vedibêje. Niha zêdetir ji 20 curên SiyaÇemane hene û çendîn kestiyên Hewramî hene ku SiyaÇemaneçirr in, ji wan jî "Osman Kêmneyî, Şefî' Kêmneyî, Muhemed Huseyin Kêmneyî, Cemîl Newsûdî, Fetihulleh Emînî, Diyare Osman, Cemîl Osman" ku ji navdartirîn SiyaÇemaneçirrên Hewramî ne. (Mîran, M, Wişe Site, 2018)

Hin kes weha dibêjim ku SiyaÇemane bi mûzîkê re jî çê dibe, lê ev ne rast e û SiyaÇemane ti carî bi mûzîkê re nabe û ew strîneke taybet a Kurdî ye ku li Hewramanê tê xwedin û xwezayî ye[11] (Hewramî, A, Kurdsat Tv 2023)



---

[11]Ta niha çi Hore û çi SiyaÇemane jî, lêkolîneke zanistî, Muzîkî û Hûnerî li ser nehatiye kirin anku notsaz nebûye. Pêwîst bû ji aliyê kesên pispor ve ev kar bihatiba kirin.

**Li Başûrê Kurdistanê Mûzîk û Hûner di îro de**:
Di vê xebatê de ta niha me hin lêkolîn û zanyarî dîtin û diyar kirin li ser rewşa mûzîk û hûnerê li vê parçeyê di sedeya çûyî de. Piştî sala 1991an û azadiya pajek ji vê parçeya başûrê Kurdistan û avabûna Hikûmeta Herêma Kurdistanê weku herêmeke Federalî, gelek sazî, navend û cîyên hikûmî û nehikûmî yên mûzîk û hûnerî vebûne. Wezareta Rewşenbîrî û Ciwanan[12] li Hewêra paytext gelek şaxên para mûzîk û hûnerê vekirine I awayeke fermî, xencî wê li zanîngeh û peymangehên başûrê Kurdistanê para "Hûnerên Ciwan" hene ku mûzîk û hûnerê jî pajeke sereke ye di wê de. Ji aliyeke dî çendîn navendên hûnerî yên netew û dînên din ku li Kurdsitanê dijîn hene.

Giringtirîn saziyên fermî yên mûzîkî û hûnerî li başûr:
- Rêveberiya Giştî ya Rewşenbîrî û Hûnerê ya Hewlêrê
- Rêveberiya Giştî ya Rewşenbîrî û Hûnerê ya Suleymaniyê
- Rêveberiya Giştî ya Rewşenbîrî û Hûnerê ya Kerkûkê
- Rêveberiya Giştî ya Rewşenbîrî û Hûnerê ya Duhokê
- Rêveberiya Giştî ya Rewşenbîrî û Hûnerê ya Germiyanê
- Rêveberiya Giştî ya Rewşenbîrî û Hûnerê ya Suryanî

- Peymangeha Ciwan a Hewêrê
- Peymangeha Ciwan a Suleymaniyê
- Peymangeha Ciwan a Kerkûkê
- Peymangeha Ciwan a Duhokê
- Peymangeha Ciwan a Rewandizê
- Peymangeha Ciwan a Raniye

Û gelek parên Hûnerên Ciwan li zanîngehên başûr de. Xencî wê gelek kom, grup, komele, sazî û takekesî hene bi karên mûzîk û hûnerê serkar in. Her weha salane geleke festival, koner û qadên mûzîk û hûnerê birêve diçin.

---
[12]Salane xelatên hûnerî ji aliyê W. Rewşenbîriyê tê dayin ji kesatiyên hûnerî re

Encam:

1.Tişitê ku xuya bû, ew coş û tîna berî raperîn û azadiyê hebûn, dibû niha zêdetir û zengîntir bûya, lê mixabin kêmtir bûne.

2.Ez weha dibînim ku peyva “SiyaÇemane”yê xencî wateya “Reşçav”î, di dûrtir de “Siya+Cem+ane”yê bûbe, ji ber ku koka wê vedigere dîrokeke kevin û berî zayinê, her weku dîroknasan wê vedigerînin dema dînê kevnar a Mêhrî anku Mîtrayî. Di dînê Mîtrayî cem bûn û îbadet û civînên dînî di cîyên tarî û nava şikeftan de bûye, bi girîm(îhtîmal) dibe ku SiyaÇemane, SiyaCemane bûbe abku cem bûn û civîna tarî yan jî cîyê tarî, li wir zikrî û îbadetên dînî kirine.

3.Di niha de li başûr nêzîkbûna mûzîk û hûnerên her çar milên welêt zêdetir bûne û gelek mûzîkmend û hûnermendên her sê parçeyên din tên başûr, yan karên mûzîkî û hûnerî dikin yan jî li vir dijîn ku ev xaleke pozitiv e û cîyê dulxweşiyê ye.

## Çavkanî:


Pîrbal, F. (2010). Mêjûy Goranî û Mosîqay Kurdî. Erbîl: Aras.

Hemebaqî, M. (2011). Muzîk û Goranî Kurdî. Erbîl: Hêvî.

Hemereş, S. (2022). Mêjûy bizir û negêrrdirawey Kurd. Suleymanî: Pîremêrd.

Abbasî, C. (2007). Hewraman û Hûner. Erbîl: Dara.

Xidir Huseyin, S. (2000). Afret le Mosîqa û Goranî Kurdî da. Erbîl: Hewall.

Rostemzade, M.S. (2012). Hûner û Teknolojî. Duhok: Xanî.

Abdulwahîd, A. (2006). Tenbûr. Hewlêr: Muduriyeta Rewşenbçriya Raman
(Terceme: Dr. Şehrezad Qasim. (1987) Tenbûr. Qeter: Kovara El-meeϴurat El-Şe’bîye. Hejmar – 8).


## Çavkaniyên Elektronîk:


Malpera: https://zaniary.com/blog/62951bd43a3b5
Malpera: https://xanmman.com/blog/62bb227fcc2a4
Malpera: https://www.rudaw.net/sorani/culture/270220155
Malpera: https://kurdshop.net/ku/culture/3471
Malpera: https://www.rudaw.net/sorani/interview/060820221